

Video: <http://youtu.be/aTdC-Q7PoNk>

Ji bo belavkirina lez

Suriye: Îstîsmarên bin Desthilatiya Deverên Kurd Girtinên keyfî, Dozên Neheq; Bikaranîna Leşkerên Zarok

(New York, Xezîran 19, 2014) - Rêveberiyên kurd yên li sê deverên bakurê Suriyê bi avayekî keyfî mirov girtine, nerastiyên daraziyê pêk anîne, û nekarine kuştinên neşkere û windabûnan zelal bikin, dibêje Çavderiya Mafên Mirovan di rapora xwe ya îro derketî de.

Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), ku baskekê Partiya Karkerên Kurdistanê yê li Tirkîyeyê ye, sê deverên piranî Kurd lê dijîn îdare dike û rêveberiyê heremî bi rêve dibe bi dadgeh, girtûgeh û polîsên xwe ji wexta ku hiqumeta Suriyê hêzên xwe ji van deveran kêşandin sala 2012'an de heta niha.

Rapora 106 rupelî ya bi sernavê “Bin Desthilatiya Kurd: Îstîsmarên li Deverên Destê PYD li Suriyê” girtinên keyfî yên dijberên siyasî yên PYDê, îstîsmarên bin çavan de, û revandin û kuştinên neşkere qeyd dike. Her wiha bikaranîna zarokan di hêzên polîs ên PYD û di baskê çekdarî, Yekîneyên Parastina Gel (YPG), de qeyd dike.

Cîgirê berbersiyarê Rojhilata Navîn û Efrîqeya Başûr ê Çavderiya Mafên Mirovan, Nadim Houry dibêje: “Deverên bin destê kurdan li Suriyê aramtir e ji aliyên şerlêdayî yên welêt, lê belê dîsa jî îstîsmarên girîng pêk tên. Hemû kontrol di destê PYDê de ye û dikare rê li ber îstîsmarên heyf bigre.”

Meha Çilê ya sala 2014'an de, PYD û şîrikên din rêveberiyê derbasbûnê damezirandin di her sê deverên bakur de: Efrîn, Kobanî û Cizîr. Konseyên mîna wezaretan pêk anîn û makeqûneke nû çêkirin.

PYDê destûr da Çavderiya Mafên Mirovan ji bo ku her sê deverên bin destê wan de bigerin û çavderiyên bikin, lê belê ji ber metirsiyên ewlehiyê tenê serdana Cizîrê pêk hat. Li wira, Çavderiya Mafên Mirovan çû du girtigehan meha Reşemîya 2014'an û bêastengî xwe gihand berbersiyaran, girtiyan û yên din.

Çavderiya Mafên Mirovan çendîn cara rûdan dîtin ku polîsên PYD, bi navê xwe yê pê tê zanîn Asayîş, endamên partiyên kurd ên rikûber digirin ji ber çalakiyên wan ên siyasî. Di hinek rûdanan da, endamên kurd ên muxalîf hatine darizandin bi dozên eşkereyî neheq piranî ji ber qaşo tevlibûna êrişên bombeyî.

Kesên ji ber suçdaryên gelek cara pêk tên binçavkirin dibêjin bêhincet hatine girtin û mafê wan ê xwe bigehînin parêzerekê qebul nebûye û ji bo demên dirêj girtî mane berî ku derkevin pêş dadger.

Herî kême neh rikûberê PYDê hatine kuştin an jî windakirin nav du sal nîv de li deverên ku temamî an jî heta radeyekê bin destê PYDê de ne. PYDê tu berbersiyarî qebûl nekirin lê belê tu

lêpîrsînên rastî jî çênêkirin. Berevajî, hêzên ewlehiyê yên partiyê bi lez û bez gelek kes bin çav kirin piştî piraniya êrîşên bombeyî, yên ku îhtîmaleke zêde bi destê çeteyên îslamî hatine kirin.

YPG ewlehiya derveyî bi cih tîne di sê deverên bin desthilatiya PYD û şerê çekdarê bi rêve dibe li dijî kom û çeteyên çekdar ên nedewletî, serî de jî El-Nusra û DAÎŞê.

Li gorî Çavderiya Mafên Mirovan seh kirî, 29ê Gulanê, hêzên DAÎŞê ket gundê al-Taliliya nêzikê Serêkaniyê li Cizîrê û herî kêm 15 sivîl kuştin, şeşê wan zarok, gundî û xebatkarên tenduristiyê bûn. Di van mehên dawî de, bi sedan kurdên sivîl girtin û qederekê wan kuştin bi tawanbarkirina ku endamên YPGê ne.

PYD û berbirsiyarên rêveberiyên herêmî dibêjin dadgeha herêmî û “Dadgeha Mirovan” a nû hatiye damezirandin serbixwe ne. Lê belê parêzer û çalakkirên mafên mirovan behsa destdirêjiya siyasî kirin di lêpîrsîn û dozan de. Di hinek rûdanan de, dadgeran hinek kes ceza kirin tenê bi mikurên wan û gazindên ji bo îstîsmarên di dema lêpîrsînan de pişt guh kirin.

Hinek girtiyan gotin Çavderiya Mafên Mirovan hêzên ewlehiyê li wan xistine di binçav de û tu caran jî cezayek negirtine ji ber van lêxistinan. Du rûdanên navê Asayîşê lê dibûre de, kesên ku li wan hatine xistin mirin. Yekê van rûdanan de endamê ewlehiyê yê ku li girtiyekê xistibû hat cezakerin. Ya din de, Asayîşê got ku wî kesî serê xwe li diwarê xistiye û xwe kuştîye. Lê belê çavderekî ku leşê wî mirovî dîtiye got ku birînên wî - hinek cihên zêde şewitiye derdora çavên wî û birîneke kur li pişt stuh- baweriyê nadin ku ewî bi xwe serê xwe li cihekê xistiye.

Du girtîgehên ku Çavderiya Mafên Mirovan çûye çavderiyan li Qamişlo û Dêrikê wusa xuya kirine ku standardên bingeîn ên navneteweyî pêk anîne. Girtiyan gotine ku rojê sê dan xwarin wergirtine û herî kêm carekê derketine sporê û karîne herin bijîşk hekê hewce bike. Du jinên li girtîgeha Dêrikê di odekê cuda de hatine girtin. Di herdû girtîgehan de jî mêr bi hevra di heman ode dimînin çî ji ber sucên piçûk çî yên mezin hatibine girtin.

Hingî ku Çavderiya Mafên Mirovan dîtiye hewldana PYD a guherandina qanûnên Suriyê di herêmên bin desthilatiya kurdan de rêbaza dadê (edeletê) tevlihev kiriye. Pêdivî bi hin guherînan heye qanûnên Suriyê de ji ber ku li gorî qaîdeyên navneteweyî yên mafên mirovan nînin, lê pêvajoya bêserûber a guherandinan serê parêzer, girtî û heta berbirsiyaran jî tevlihev kiriye ji ber qanûnên niha tên bikaranîn.

Pêşdeçûneke erênî ye ku makeqanûna nû hatiye pejjirandin di meha Çilê de, ku wek Hevpeymanîya Civakî tê binavkirin, guncav e bi hinek standardên girîng ên mafên mirovan û bikaranîna dardekirinê qedexe dike.

Her çiqas Asayîşê û YPG soz dabe di sala 2013'an de ku ew û zarokên 18 salî piçûktir bikarneynin ji bo armancên çekdarî, dîsa jî ev pîrsgirêk didome li gorî Çavderiya Mafên Mirovan. 5ê Xezîranê, YPG bi avayekî êşkere soz da ku dê hemû şervanên ji 18 salî piçûktir ji nav hêzên xwe derxe di nav mehekê de.

Rêzîknameyên navxweyî yên her dû hêzan jî qedexe dikin bikaranîna zarokên 18 salî piçûktir. Qanûna navneteweyî ya ji bo komên çekdar ên nedewletî lê ye li Suriyê dibêje 18 temenê herî

piçûk e ji bo wergirtin û beşdariya kesan di şer û pevçûnan de, bikaranîna zarokan wek rêçger, qasîd û li cihên kontrolê jî nêv de.

Çavderiya Mafên Mirovan, her wiha, 27ê Xezîranê li Amûdê bûyerên tund kola, dema hêzên YPG tundiyêke zêde bikaranîn li dijî çalakvanên dij-PYD, gule hatin reşandin ser sê mêra û ew hatin kuştin. Wê şevê hêzên parastinê 2 mîrên din jî kuştin di gengeşiyên şûlû (nezelal) de, rojtira din yekî din jî hat kuştin. Şeva 27ê Xezîranê, YPG qasî 50 endam an jî alîgirên Partiya Yekitî ya muxalîf keyfî binçav kirin li Amûdê û di navendeke leşkerî de li wan xistin.

Divê rêveberiya bi destê PYD, ku ser hukmê ye li Efrîn, Kobanê û Cizîrê, dernekeve derveyî qanûna navneteweyî ya mafên mirovan û ya însaniya navneteweyî. Ji bo vê yekê jî îşkence, binçavkirinên keyfî, bikaranîna leşkerên zarok were qedexekirin û dozên heqanî werin bi rêve birin di mehkemeyên rêk û pêk de.

Ji bo ku ev kêmasi werin rastkirin, Çavderiya Mafên Mirovan van gavan pêşniyaz dike: ji bo dozên girtiyên siyasî ji nû ve werin vekolîn komîsyoneke serbixwe pêk were, û her keseke ku bê belasebeb hatibe binçavkirin were berdan. Divê dezgeheke aşkere were damezirandin ji bo girtiyên ku îstîsmarên di dirêjîya binçavkirin, lêpîrsîn û girtinê de werin qeydkirin, paşî jî di mehkemeyên rêk û pêk de doz were vekirin li wan kesên mesûl.

Divê mehkemeyên nû hatine damezirandin li hev bin bi qanûnên Suriyê û werin hevahengkirin li gorî standardên navneteweyî yê mafên mirovan. Hemû guherandinên di qanûnên Suriyê de divê yekser werin çapkirin û belavkirin.

Divê Asayîş û YPG wergirtina kesên 18 salî piçûktir rawestîne û yê niha nav hêzên wan de cih digirin ji peyvîrê derxin.

Houry dibêje: “Serkêşiya kurd a li bakurê Suriyê dikare gelek zêdetirê bike ji bo parastina mafên mirovan ên hemû kesan - kurd, ereb, sûryanî û yê din - li deverên ku serdest e. Her çend rêveberiyekê dema derbasbûnê jî be divê hukmeke dorfîreh bike û guh bide fikr û ramanên rexneyî.”

Piştî belavkirinê, hûn dikarin raporê ji vir peyda bikin:

<http://hrw.org/node/126065>

Ji bo agahiyên zêdetir ji Çavderiya Mafên Mirovan derbarê Suriyê de, ji kerema xwe herin ser malpera:

<http://www.hrw.org/middle-eastn-africa/syria>

Ji bo agahiyên zêdetir, pêwendî:

Li Amsterdamê, Lama Fakih (îngilîzî, erebî): +1-646-515-1468 (mobile); an jî fakihl@hrw.org. Ser Twitterê @lamamfakih

Li Beyrutê, Nadim Houry (erebî, frensî, îngilîzî): +961-3-639-244(mobile); an jî houryn@hrw.org. Ser Twitterê @nadimhoury

Li Berlinê, Fred Abrahams (îngilîzî, elmanî): +49 (176) 314 652 69 (mobile); an jî abrahaf@hrw.org. Ser Twitterê @fredabrahams